

# Jîn

Jimara nehê

Heyva Kanuna Dûê 2007

Vercinye, Emrîke

perê - 1

**Serê salê pîruz bit!** Li vê demê salê ez hes dikim bînim bîra xu hemî çalakî u delîva yê sala çûî. Sala 2006 bu min her dû xuş u zehmet bîn.

Programa Inglîzî ya me li Zaxo u Dihukê bu salekê girtî ye da em hêş amade bikîn. Pêtivî bî min kitêbê Inglîzî dîtî ban me şîa yasaî (qanunî) çapî bikîn. Bu sala 2006 me hindek ders ji internetê kîrrîn, u bu sala 2007 dê me kitêbê xu yê nî hebin. Havîna bêt dê sêî programa Inglîzî li Zaxo bi kar bîn! (Li me bibure - havîna bêt programa Inglîzî ya Dihukê nîne.)

Sala 2006 heyva êk xoşka min çû ve Oğunde (li Efrîqîa). Ew li wêrê mamosta ye ya zanîna xwendin u nivîsînê. Ez nabînim heta dû sê sala. Babê min dû car ‘emelîat kir u ew gelek zehmet bî bu her dû deyk u babê min. Birayê min mala xu bir ve Emrîke piştî hindek sala li Filipînê dijîan. Min harî karîa wan kir, min timbêla wan ji wîlayeta Teksîs heta wîlayeta Waşîngten hajut. Rêka me neh roj bîn çunku li ser rêkê em çûn mêhvan malê miruvê xu u hevala.

Li sala 2006 dû hevalê min mirin. Hevalek dî pênceşêr (seretan) hebî, belê bi çakîa Xwidê u bi

dermankirina kîmîayî sax bî. U hevala min ya dî biçîk ji ber çû. Nevîa meta min ji nesaxîa şekirê mir.

Sala 2006 jî gelek xuş bî! Ez li nik hemî mala xu bîm. Êk car li gel xoşka xu, dû car li gel mala birayê xu, u dû car li gel deyk u babê xu bîm. Hindek hevalê min biçîk bîn (Ser xêrê bit!) u keyfa min hat çunku min şîa bu biçîkê wan betenîa çekim. U min behira pitir salê li gel hevalê xu li Vercinye burand. Min hevalê xu yê kevin u nî dîtî.

U li sala 2006 min nivîsandina **Jîn** dest pê kir!

Miradê te bu sala 2007 çi ye? Heker Xwidê hes bikî xizmeta min bu sala 2007 eve ne:

- Heyva dû bu dû heftîa ez dê çim ve bu Kurdistanê.
- Havîna bêt bu dû sê heyv ez u hindek mamostayê Inglîzî dê çin Zaxo.
- Heyva yazde ez dê cejina şikirina deyk u babê xu pîruz kim li gel wan. (50 years!)

Xwidê miradê te bikî li ser şulê qenc u baş!